# zanîngeh

Pûşber 2011 Hejmar 1

Kovara Zanist û Lêkolînê



# Weşanen Zanîngeh

**Ji bo ragihandin û daxistinê**

**www.zaningeh.net**







# Ji Bo Heyfa:





Ehmedê Xanî
Melayê Cîzîrî
Feqîyê Teyran
Melayê Batê
Mewlana Xalid
Baba Tahîrê Ûryan
Elî Herîrî
Bedîûzzaman Seîd Nursî
Xelîl Xeyalî
Seyîd Elî Findiqî

Mela Mehmud Bazîdî
Seyid Riza
Şex Seîd
Celadet Elî Bedirxan

Û mezine ku me nave wan ne gotin,
Û ji Gele Kurd e Xabatkar e Çand û Zimanê Xwe re...

Kovara Zanist û Lekolîne

# zanîngeh

Kovara Zanist û Lekolînê

Kovara Zanistî û Lekolînê
Li ser navê Weşanên Zanîngeh
û li ser navê malpera www.zaningeh.net

Xwedî û Berpirsyarê Giştî
Dilazad Art

Edîtor û Serrastkirin
Ridwan Xelîl

Mîzanpaj û Rûpelsazî
Ridwan Xelîl

Berpirsyarê Teknîkî
Xelîl Ciwan

Pîsporê Zanistî
Gulîstan Azad

Şêwirmendê Hunerî
Nûpelda

Berpirsyarê Nivîsan
Muaz Remezan
Bahadîn Cibilgiravî

Ragihandin
Yaşar Oktay
Bahadîn Cibilgiravî

Reklam
Zanîngeh Production
Ajans Zanîngeh

Çapa Dîjîtal
Weşanên Zanîngeh

Çapa Yekem
Îzmîr, Gulan 2011

Bo na pêwendîye
e-mail : zaningeh.net@gmail.com
zanîngeh@hotmaîl.com
tel : 0 505 235 53 24 - Dilazad ART
0 505 638 61 33 - Ridwan Xelîl
web : www.zaningeh.net
Hesabê Poste : 6165091

# Çend Gotinên Taybet

Bi slavên germ…
Xwendevanên hêja û birûmet…
Ziman, stûna jiyana civakîye…
Ziman, nîşana şarezatîya mirovane…
Ziman, hêz û balpişta pêşketina mirovane…

Civakên ku zimanê xwe ê zanistî avanekiribin di dîroka mirovahîyêde wek şaxekî qels dimenîn an hildiweşin. Zanist, kurahîya mejî û ramanên civakane… Her civak li gor kurahîya zanîna xwe bi bandore…

Em wek xebatkarên Koma Weşanên Zanîngeh bi van armanca ketin rêyekê nû. Heta niha bi tevahî rojname, TV, radyo û kovarên kurdî tenê li ser weje û çandê rawestîyane. Me xwest em zimanê xwe di nav zimanê cîhanê de bidin naskirin. Bi vê armancê me xwest em zimanekî zanistî avakin. Hevîdarim ku ev xebata me yê roj bi roj geştir bibê.

Di kovara me de her curê zanistî yê ê weşandin. Çi zanistê civakî û çi zanistê teknîkî. Li gora me teknîk bi tena serê xwe kerr û kor û lal e. Zanistên civakî jê re dibin guh û çav û ziman. Dîsa li gora me zanistên civakî bi tena serê xwe paşdemayîne û teasube û bêhişîye. Zanistên teknîkî jê re dibê pêşdebirin û lêkolîn û hiş.,. Her zanist bi şaxekî xwe bi zanistê dî re giredayîye. Bi tena serê xwe şaxeke zanistî têra mirovahîye nakê. Bi ba me hemû zanist alîkarê hevin. Em wa jev cuda nabînin. Bi ve armancê derîye me ji her curê zanistê re vekirîye.

Çima e-kovar?

Ji ber ku dem dema teknolojîyê ye. Ji ber ku dem dema ragihandinê ye. Ji ber ku her kes her dem nikarê kovarên li ser kaxezê hatîye weşandin bibînê, bikirê û bixwenê. Ji ber ku belavkirina kovarên li ser kaxezê hatîye weşandin zor zahmete. Ji ber ku çapkirin bimesrefe. Ji ber ku xwendevanên kurdî kêmin. Ji ber ku nîyeta me ji bo mirovahîye hizmete. Ji ber ku armanca me ne karê peraye. Ji ber ku em hizmeta berîka nakin tenê hizmeta ayeteke Xwedê –ku ew jî zimanê kurdîye- dikin. Ji ber ku em xwe pêşdebibin. Ji ber ku em xwe nasbikin. Ji ber ku em ala zimanê xwe li serê çiyayê gerdûnê bilindbikin. Ji ber ku zanistî nekêvê destê heramzadêya. Ji ber ku rumeta zanistîyê nekevê binpîya. Ji ber ku zanistî xwe naskirina mirove. Ji ber ku em dixwazin civakeke raman azad avabibê. Ji ber ku jiyaneke bi rumet bijîn. Ji ber ku ê bixwazê li kuderê, di kîjan demê û di çi mercîdebê bigihêjê zanista bi kurdî.

Bi hevîya hezar hejmaran…

Ridwan Xelîl
Edîtor û Çapger
Kovara Zanîngeh

Dilazad Art
Xwedî û Berpirsyarê Giştî
Kovara Zanîngeh

# Naverok

Wêje: Alfabêya Kurdî
Celadet Elî Bedirxan.......................................................................07

Kîmya: Hormon
Bahadîn Cibilgiravî.......................................................................09

Biology: Naverokên Adan Û Wezîfên Wan
Seyid Bênav.......................................................................13

Ragihandin: Ragihandin
Rîdwan Xelîl.......................................................................15

Biology: Şane û Taybetiyên Şaneyan
Bawer Aslan.......................................................................20

Tendurustî: Şewb Û Enfeksıyonên Weke Şewbê
Siddik Ergul.......................................................................24

Felsefe: Li Ser Jiyanê Axaftinên Taybet
Dilazad ART.......................................................................26
.
Civaknasî: Jiyana Zanîngehan
Bahadîn Cibilgiravî.......................................................................35

Wêje: Di wêje ya kurdî de pirtukek nû
Ridwan Xelîl.......................................................................42

Bîrkarî/Matematîk: Jimarê û Hejmar
Hasan Erez.......................................................................44

Celadet Elî Bedirxan

# Alfabêya Kurdî



*Ji Kovara Hawar Hejmara 1.*

***Bi navê yêzdanê pak***
***ê dilovan û mihrîvan.***



Alfabêya Kurdî ji sîh û yek herfan hevdudanî ye:

***a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z.***

Herf di dengdayiyê de du texlît in: ***Dengdêr û dengdar***.

***Dengdêr*** ew herf e ku dixwedeng e, û dengê wê bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne.




***Dengdar*** ew herf e ku dixwedeng e, ê lê belê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve.

***Di zimanê Kurdî de 8 dengdêr hene:***
***a- e- ê- i- î- o- u- û***

Lewre ku di denganîya Kurdî de dengdêrek geh kin û geh drêj nabe dengdêrên Kurdî di drêjahiya dengên xwe de sersekinî ne: ***kin ûdrêj in.***

***Dengdêrên kin:***
e : der, şer, ser
i : kin, din, bin
u : Kurd, kur, kul

***Dengdêrên drêj:***
a : av, sar, bar
ê : dêr, şêr, mêr
î : tîr, zîv, şîv
o : dor, sor, kor
û : kûr, şûr, dûr

***Di zimanê Kurdî de bîst û sê dengdar hene:***
b: bar, bav, ban
c: car, can, cûn
ç: çar, çûn, çem
d: dar, dan, dîn
f: fanos, filan, find
g: gav, giş, garan
h: hîm, hêja, halan
j: jin, jor, jajî
k: ka, ker, kom
l: lo, law, lez
m: mar, mêj, mak
n: nan, nerm, nas
p: par, por, pehin
q: qîr, qenc, qelî
r: rê, rû, reş
s: sar, sebat, sofî
ş: şor, şev, şa
t: têr, taket, tûj
v: vajî, vala, virnî
w: war, werîs, wek
x: xanî, xwarin, xêr
y: yar, yek, yarî
z: zor, zabit, naviz

Ji van pêve du herfên biyanî hene ku birek ji Kurdan wan dibêjin.

Lewre ku ew herfên ha di eslên xw de ne Kurdî ne me ewneêxistine nav alfabêya xwe.

Ew jî (غ) (ح) ne, me ew du herf bi danîna du deqan ser (h- û x-), H wek hal, û X xar.

Ku ev du deq ketin ev herfên ha vedgerin ser herfên Kurdî û dibin h, x. ji xwe piraniya Kurdan şûna (غ) (خ) dibêjin; ***xeyîdîn***

Hawar dengê zanînê ye. Zanîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ku xwe nas dike dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ku ziman şerta beyînê a pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştê ku Kurdanî û Kurdîtî pê bendewar e dê mijûl bibe.

Bi xêzên jorîn ve me rêberî û rêzaniya Alfabêya Kurdî kuta kir. Ji niho pêde bi hûrhûnandina hevdûdanîna wî dê mijûl bibin, dûmahîk heye .

***Bahadîn Cibilgiravî***
***Lêkolînêr***

# Hormon

Hormon; tê wateya mezinahiyê bi saya bedena mîrovan. Hormon; ji bilî mezinbûnê, pêkhatina bêhnê û tehma nebatan re pir girînge. Hormon mezinahiyê di laş ê însande bi zêdekirina senteza proteînê destpê dikê. Amînoasît bî şaneyan tên ferikandin; dûv re amînoasît têne berhev û proteîna hîşyardikin bo zêdekirna sentezên proteînan. Jî xwe proteîn dîhêlê; kam a hestûyên mîrovan dirêj bibê, masûlkan geş bibe, kebarên organên hindir fireh bibe. Hormon dihêlê çermên însanan nerm bibînê. Tendurustiya neynûkan jî mikateye… Loma hormon di însan û nebatan de gelek wazîfên cûda û xweser digrin. Îro ji însan û nebatan re ji tunebûna wan tiştek naqedê. Wekî din jî di nav gel de bi pirranî wateya hormonan bi çewtî tê zanîn, gelê me li ser hormonan gelek tiştan nizanê. Tîştên ku zanê jî hinin ji wan ne rastin... Hormon tiştên sirûştî di hindirê însan û nebatan de cî girtiye. Dema ku ji bilî sirûştî mudaxeleyek hebê ew jî sirûştîyê derdikevê dibe berên kîmyevî. Lê dî nav gel de hormonên ku saya madeyên kîmyevî re hatine xerakirin jî hormon tê nasîn, ew tîştekî ne raste; dema ku madeyên kîmyevî kete nav hormonan ji bo ku hormon bi sirûştîye derdikevin em nikarin bêjin ew hormonên ku hatinê pêlîstandin ji niha pêve bi sirûştîye.



## *Nebat Û Hormon*

Nebat bi çêbûna xwe an jî sirûştîya xwe bi hormonin. Hormon di nebatê de şax girtine ji bo wazîfên nebatî. Hormon dîhêlê ku: bêhna xweş ji nebatan bê, niherînek berikandî bê peyde kirin, tehmek xweser pêk bê; nebatan ji derbeyên derve diparêzê, wan distirînê... Lê wazîfa pêşî mezintiya nebatane. Ku em ew nebatên xwedî hormonên sirûştî di nav jiyana xwe bikar bînin wê jiyanek tendurustî



li hemberî me bê. Nebatên xwedî hormonên xwezayî tew dermanin; antîoksîdan(jehrkûj), vîtamîn, enerjî…

Di nebatan de hetta niha tê zanîn ku 5 cûreyên hormonan hene: oksîn, gîberalîn, sîtokînîn, etilen û asîd a absîsîk. Ji xeynî wan hinin hormonên kîmyevî jî hene.

## *Beşên Hormonên Mezinahiyê*

***1) Yên Mezinahiyê***

***A) Hişyarker (stîmûlator)***

-Oksîn

-Gîberalîn

-Sîtokînîn

***B) Astengkar (Înhîbîtor)***

-Asîd a Absîsîk

-Etîlen

***2) Hormonên Organan Çêdikin***

-Florîgen

-Vernalîn

-Rîzokalîn

***3) Hormonên Birînê***

-Nakro



***1) Yên Mezinahiyê***

***A) Hişyarker (stîmûlator)***

### *Oksîn*

Şaneyên şaxan dîrêjdikê wan bi dirêjayî li hev tînê

Caran wazîfa dirêjayiya kam a nebatê dikê.

Dibê sebeba fototropîzmayê, bal a ku herî tê kişandin ew e. fototropîzma, dema ku nebat deverekê ronî bistînê deverekê jî nestînê mezinahiya her dû aliyan cûda dibê; di wir de oksîn dîkevê devrê û dihêlê şaneyên ku ronî nastînin hişyar bibin û nebatê ji aliyê mezinahiyê pêşxînin.

### *Gîberalîn*

Kencî ya wê jî ji nebatê re dîrêjbûna newka nebatêye.

Dihêlê nebat zîlbidin û çîm hêşîn bibin

Ji bo kulîlkvedayiyê nebatan hişyar dike.

Ji bo gul ên zû venabin alîkariyê bi ronîyê dikê û guldana wê bi lez dike.

Pîrbûna pelên nebatan û fêkiyên tirincî dereng dike.

Nerîna pelan dixemilînê…



### Sîtokînîn

Zêdebûna şaneyande û şaneyên nexweseriyên ciwande xweseriyîtiyê dike.

Ji ber ku hişyarbûna sîtokînezê de wazîfê distînê navê sîtokînîn lêkirine

Li gel hewldana mezin jî ne enzîme ku sîtokînîna diafirînin ji nebatan pakijkirine ne jî genên ku wê kodkirine hatine naskirin;jixwe lêkolînerek gotiye ku nebat nikarê sîtokînê xwe hilbirînê û ew hormon bi zendîlên(bakterî) sîmbîyotîk we tê sentezkirin.Bi rastî jî dema ku ev zendîl ku ji nebatan derdixin pêşketina nebatan jî kêm dibe.Le ew hîpotez hîna jî tê nîqaşkirin.

## *B) Astengkar (Înhîbîtor)*

### *Asîd a Absîsîk*

Tevgera Nebatên ku li deverê cemidî û zuwayî de konrol dike, li gorî tiştên têne guherandin berteka dide.

Li depokirina amînoasîdan û şekirê asîda absîsîk de cî digrê.

AAB demsala çille de li nebatên êzingî de alîkariya zîlkirina şaxan dikê.

Pelên nebatan zû bi zu pîr dikê; hişyariyê didê etîlenê lê ji bo hişyari pîrkirina pelan de hişyar dike.

### *Etîlen*

Nebatên ku li derdora baranîya tund, sermayî, qeşayî, cemidî de dor a nebatan dorpêç dikin û wan ji wan tiştan nebaşî dinixumînin.

Dema fekî stewiyan senteza etîlenê zêde dibê.

Hemberî zîwahî, lehî, ba, sermayêde jî etîlen behtir tê sentezkirin û dijî wan tiştan nebatan rizgardikin.

Îro li ser dinyayê bi mîlyaran însan dijîn herkes mecbûre kedandina xwe bike. Ji bo kedandina însanan mezaxa nebatan pir cîhekî girîng digre. Bo milyar însanan re hilbirandina nebatî jî bibe. Gelo ew tiştên nebatî karê bigihêje wan hejmaran, mixabin nagihêjê. Ji ber ku nagihêjê însan ji bo hilbirînê anternatîfnin din geriyane; pêşî seravantî derketiye ew jî zikê însanan têr nekiriye dest bi rêyên nesinc re çareserî geriyane. Dawiyêde tîştên kîmyevî ye ku hormonan bê kontrol dikin bikaranîn. Ew jî bûye pirsgirêkek mezin. Ku hormon sirûştîbin nebat jî sirûştîye; lê ku hormon bê kontrol man û bi lezî şixûlîn wî wextî hormon wazîfa xwe tam nakin, nebatên ne bi kêrhatî têne holê. We ku ne bi kêrhatîne jî zirarên didin însanan, caran jî tê deverekê ku DNA ya însanan hemberî mutasyonê tê an jî genên însanan pirsgirêk dibin. Di nav gel de dibêjin ''ew fekî bi hormonin, ew nebat bi hormonin''; lê ew gotin gotinek ne raste. Ji xwe nebat bi hormonin, ma bê hormon nebat dibe! Ê wî wextî em dikarin wê gotina çewt wilo biedilînin.Bi hormonên wan fekîyan an nebatan lîstine; tiştên kîmyevîre hiştine ku tahmsarkîbin, bê bêhnbin, bê dendikbin (an jî kêmin), tev avîbin…



Dema ku wîjdan di dilê însanan de nebê, qayîdeyên sincî neynin ber çava her tîştên xerabî ji wan tê. Îro di hindirê çile de em dinehêrin ku wa ye nebaten havînê jî derketiye, ew çawa çêbûye, çi qewimî ku ew nebat di hindirê çile de çebûye? Ew nebatên bê zaman ku derdikevin bi hormonên wan lîstine, hiştine ku di hindirê çile de jî hilbirîna wan bidomê; le ji ber hormon wê demê înaktîfin û karên xwe nakin, bi madeyên kîmyevî dîhêlin wan hormonan bi zorê aktîfbikin. Ew jî dibê sedema hilbirîna bêetîk. Ji bo ku ew nebat bê sûdin, gelek zirar didê mîrovan. Hemberî wê çareserîyek bi navê ''çandina organîk'' derketiye. Raste dema ku nebat bi sirûştîya xwe çebibê wî wextî di nava nebatan de buyerên organîk pêk tên; lê bo ku bi madeyên înorganîk wan hormonan su-î îstîmal dikin wî wextî pêk hatinek organîkî çênabê…

Seyîd Bênav

Mamoste

# Naverokên Adan Û Wezîfên Wan

Adan ji bo zindîyan pir girîngin. Di be kû dinav xurikan de ji yekê zêdetir jî adan hebin, lê di naveroka wê de kîjan adan zêdetirbe wê di wê komê de bê binavkirin.

Adan li gorî naverokên xwe bi va cûreyan tên komkirin: Karbonhidrat, proteîn, rûn (Dohn), vîtamîn, av û mîneral.

## *Karbonhîdrat:*

Tiştê wekî meqarne, girar, nan vejenê (enerjîyê) pêk tînin û mêjerek zêde karbonhîdratê di hewirînin. Karbonhîdrat xurikên bingehînin. Vanan di laşê mirov de di demeke kin de diveguherin vejenê.





## *Proteîn:*

Proteîn di bedena mirov de wezîfeya avakarî û selihandinê (tamîrbun ê) dikin. Ji bo mezinbûnê, gihiştbûnê, başbûna birîna, başbûn û parastina bedenê li hemberî mîqroba pêwistî bi proteînan heye.

***Rûn:***

Karên zêde vejenê dixwazin kû em dikin vejen a kû em ji karbohîdrata distînin kêm dimîne. Di rewşê wilo de pêwîstîya kû em ji wejenê dibînin ji çavkanîyeke din ya vejen ê ji rûn tê temîn kirin. Rûn ji nebat û sewalan (heywanan) tê bi dest xistin.





***Wîtamîn*:**

Wîtamîn di bedena me de wezîfa sazgêrîyê dikin. Bedena me ji nexweşîya diparêzin. Ji bo jiyanek bitenduristî pir girîngin.





***Av:***

Ji bo zindîyan berdewamkirina bizavên jiyanî, girîngiya avê pir mezin e. Kêmzêde ji %70'yî bedena me av e. Di bedena me de av wezîfeya sazgêriyê dike.



***Mîneral:***

Mîneral di bedena me de wezîfeya sazgêriye dikin. Em mînerala bi xwarin û vexarinan re distînin.

**Ridwan Xelîl**

**Ragihandvan**

# Ragihandin

Dema ku bilbil dest bi wîtwît e dikin,
Qijik denge xwe qut dikin.
Mewlana

Ragihandin çiyê? Li gor zanîsta ragihandinnasî ragihaner ji bo ku ragihandine bidin nasîn dibejin ku nasînê me e ragihandine bêhed û bêhesabin. Le belê ji bo ku em bizanibin bê ragihandin çiye em e hinî nasînen ragihandine pêşniyarî we kin.



Pêşî bi kurtasî em ji bo ragihandine dikarin bibejin ku ragihandin, cureyek parkirina agahîya ye.


Ji bo ragihandineke bi bandor jî pêviste ku peyam di bingeha xwe de xwedî bandor bê.

Ragihandin, weke ku li teşê e jêr jî hatîye xîz kirin bi kurtasî bi cihokeke re danûsitana peyamaye.







Ragihandina di nav mirovan de, bi zanîn, raman, hest, helwest, bahwerî, hwd. teşeyên tewgeran (shape behaviour) di nav şandiyar (sender) e ku dibe çavkanî û girtiyar (receiver) de bi tekîlîye di harikene hev û ew heste ku me li banî gotin yan tên guhardin yan jî ji nû tên ava kirin.




### A. *Armanca ragihandine*

Armanca ragihandine ewe ku tevgere (behaviour) girtiyar biguharenê yan jî ji nû çebike. Le bele bê armanca ragihandine nehele ku qezayên ragihandine çebibin.



### B. *Qezayen ragihandine çine?*

Dema ku em di nav ragihandine de heydar yan jî nehaydar girtiyare xwe bieşenin qezaya gihandine pek tê. Di qezayên ragihandine de yen birîndar ye ku di xeyîdin, dilşikest dibinin û hwd. Yen ku dibin mirî jî ye ku ji jiyane xwe qut dikin, xwe dixin nav tenetîye de û hwd.


Be çava ku di rê de ajotvanek weke ku tu kes nîne tirembela xwe biajone we deme qeza çedibe, ku merîvek dema ku di axive ku ne fikire be çava li girtiyar (receiver) e xwe bandor dike we deme heye ku qezaya ragihandine çebibe.

### C. *Ragihandin sazûmaneke*

Ku sazûmana ragihandine ne we çekirin ragihandin çenabê. Ku em sazûmana ragihandinê baş nizanibin her dem çedibe ku em qezayeke ragihandine bikin.


Di bingehe dê sazumana ragihandine ji peyam, şandiyar, girtiyar, girtin, vekirin, bersiv, cihok û ji hevgerdûn pek tê.

*Peyam*: Di ragihandine de tişte ku ji bo xwesteke bene diyarkirin peyame pek tînin. Peyam peyman a di nav şandiyar û girtiyar de ye.



*Şandiyar*: Kes e ku ji bo helvest û hesta biguherenê û bersivê

Ragihandin li cihe ku hevgerdûn hebe çedibe.
Ango ragihandin di hevparê şandiyar û girtiyar te pêk tê.
Peyama ku şandiyar giredayê ku girtiyar nigaribe veke ev nabe ragihandin.
Ragihandin bi vekirna peyama giredayî û bersivdana we çedibe.






bistênê peyame dişîyen ji girtiyar re.

***Girtiyar***: Kes e ku li hembere şandiyar peyame distênê û bi erenî yan jî bi neyînî bersivê şund e dişiyene ji şandiyar re..

***Girtin***: Dema ku peyam vere şîyandin ji bo ku girtiyar fehm bike bi teşeye ku girtiyar fehmke te amadekirin û da newê tevlûhev kirin mîna bexçikeke bi pergeleke te giredin duvre te şîyandin be giredan di nav sinore hevgerdûne de bin yan jî girtiyar nikare veke li dawîye jî ragihandin pek naye.

***Vekirin***: Dema ku peyam te girtin û te şîyandin û digihe deste girtiyar ji bo ku girtiyar fehm bike be çi agahî hatîye şiyandin li gor ferahîya remanê xwe vedike, ev vekirin be di nav hevgerdûne de be ku ne di hewgerdûne de be naye fehm kirin û ragihandin pek naye.

***Cihok***: Di ragihandinêde dema ku şandiyar peyame amade dike yan di hevgerdûnede giredide

be rêkek hebe ku peyam were şiyandin ji girtiyar re. Deng, nivîs, tevgeren laş û hwd. Her yek ji van ji bo ku peyam were şiyandin dibin rê yanî dibin cihok.



***Bersiv***: Şandiyar ji girtiyar re di hevgerdûn e de peyam gireda û bi cihokeke şiyand, girtiyar peyam girt û vekir duv vê re be girtiyar di hevgerdûne de bersiveke erenî yan jî neyînî amade bike û bi cihokeke bişiyene ji şandîyar re da ku ragihandin bigihe armanca xwe. Li vê de re ku we balda be hûne bibînîn ku di ragihandine de şandiyar bê bibe girtiyar jî û girtiyar bê bibe şandiyar jî. We deme bi zanistî em karin bibejin ragihandin çebû.

***Hevgerdûn***: Wateya gerdûn e hemû hebûne li derûdora me ne. Dinye, rojger, peyk, kevir, merîv, hewa, esîr û hwd. Ew hemû hemanên gerdûne ne. Yanî gerdûn ji timî hebûna pek te. Hevgerdûn jî ji hevparên di nav şandiyar û girtiyar de pek te. Di siya hewparan de şandiyar û girtiyar ji hew fehm dikin û ragihandin çedibe. Mînak, zimane kurdî di nav kurdan de ji bo rgihandine hewgerdûnêkê pek têne.

Ku bersiva şandiyar newê ragihantin çênabê. Çimkî ragihandin bigerew e, yanî bi direjayî nave mijara me ragihandina bigerew e. Ragihandin bê di hevgerdûne de be, yanî peyama ku hatîye giredan dema ku hate şiyandin bê girtiyar karibe peyama giredayî vekê û je fehm bike. Ku peyam hebe le ku cihokek nînbê ji bo ku here ji girtîyar re dîsa ragihandin çenabe, peyam bi şandîyar re dimênê, ragihandin çenabe.



## D. Cureyên Ragihandine

### 1. Li gor çebûne

Ragihandina bideng
Ragihandina bêdeng
Ragihandina nivîskî

### 2. Li gor beşdarbûne


Ragihandian bixwe (a Hûndûrî)
Ragihandina navbera kesan
Ragihandina girse û

Baldarîyek: Emê peşerojê de li ser ragihandine di weşanen nû e kovara zanîngehê de behtir bisekinin…

### Ferhengok:

Ragihandin: Îletîşîm
Ragihaner: Îletîşîmcî
Gihaner: Îletîcî
Cihok: Kanal
Bigerew: Karşilikli
Ragihandina Bigerew: Karşilikli îletîşîm
Ragihandina bideng: Seslî îletîşîm
Ragihandina bedeng: Sessîz iletîşîm
Ragihandina nivîskî: Yazili Îletîşîm
Ragihandian bixwe: Îçsel Îletîşîm
Ragihandina Girse: Kîtle iletîşîmî






Evîn
Pirseke
bêbersiv e
Dûyekî
bêagir e
…

… û evîn bû destan
Ne li ser zimanan
Bi nivîsê hate belavkirin.

Dilazad ART

Bawer Aslan

Tenduristiwan


# Şane û Taybetiyên Şaneyan

***Şane:*** Biçûktirîn avahîya erkî ya hemû jîndaran e. Di laşê mirovan de bi trîlyonan şane hene. Mezinahiya şaneyan ne li gorî mezinahiya bedenê ye. Ji bo mînak em dikarin şaneyên mişk, fîl û mirovan bidin. Mezinahiya şaneyan wek hev in.

Şane li gorî membran (zar, pergî, çermik) û bûjenên genetîk dibin du bera;



Şaneyên Okaryotîk



***Şaneyên Prokaryotîk***;

Şaneyên serbixwe ne. Bi serê xwe dijîn û zêde dibin. Nukleûs ango dendikê wan tuneye û li dora DNAya wan membran tuneye. Mînak; amip, bakterî.. hwd.

***Şaneyên Okaryotîk***;

Dendikê wan û lebatokên (organel) wan ên bi membran hene. Mînak; şaneyên heywan û nebatan.

*Şane bi taybetî di sê beran de têne lêkolîn kirin. Ev sê ber;

a-Çermikê Şaneyê (membran),


b-Lebatokên Şaneyê,

c-Sîtoplazma.



Werin em yek bi yek lêkolînek biçûk li ser van bikin..

## *A)Çermikê Şaneyê;*




Membran,

-Yekîtiya avahî ya şaneyê diparêze,

-Sehêtkirina (kontrol) derbasbûna hin bûjenan dike (hin îyon, rûn, proteîn û av)

-Sînyal û nûnên (molekül) ku ji aliyê şaneyên din ve têne şandin nas dike,

-Hin bertekên (reaksiyon) kîmyevî dike,


- Di tevgera şaneyê de cîh digire,

- Piştgiriye ji bo kakûtê (iskelet) şaneyê dide.

## *B)Lebatokên Şaneyê;*

Li gorî xebat û erkên xwe ji hev diqetin.

### **Mîtokondrî;*





-DNA ya wê heye,

-febrîqeya enerjiyê ya şaneyê ye,

-cîhê bêhndanûstansinê ya şaneyê ye,


-mirov dikare bêje ku kezeba şaneyê ye.

### *Nukleûs- Dendik;




-mezintirin lebatoka şaneyê ye,
-bûjenên genetîk diparêze,
Lebatoka karger e (rêvebir).

### *Lîzozom;





-ji serifandina xwarinan berpirsiyar e,

-carinan serifandina hin lebatokên pîr û bêerk jî dike,

Ger membrana wê qul bibe, tirşînên (asit) lîzozomê li şaneyê belav dibe û şane xwe bi xwe tune dike. Ji vê bûyerê re otoliz tê gotin.


### *Endoplazmîn Retîkûlûm;




-mîna torekê tevahiya şaneyê rûdigire,

-ji hilberîn û barkêşîya lik û avzêyan berpirsiyar e.

### *Cismê Golgî;





-di berhevkirin, barkirin û avêtina bûjenan ya derveyî şaneyê de cîh digire.

### *Sentrozom;


-ji çêkirina mîkrotubul (hin proteînên kakûtê şaneyê) berpirsiyar e,

-di dema dabeşîna şaneyê

Şaneyên Okaryotîk





Şaneyên Okaryotîk




de ji parvekirina kromozoman berpirsiyar e.

### *Rîbozom;

Şaneyên Okaryotîk






-lebatoka sereke ya hemû şaneyan e,

-di hilberîna proteînan de cîh digire.

### C)Sîtoplazma;

-ji aliye membrana şaneyê ve hatiye dorpêç kirin,

-ji sedî 75-80 yê wê (%75-80) av e,

-hemû lebatokên şaneyê di sîtoplazmayê de ne,

- ji aliyê kîmyevî bi alîkariya 5 erkan pêk tê. Ev erk;


1-av (%75-80),

2-elektrolît,

3-proteîn,

4-lîpîd (rûn, fosfolîpîd, kolosterol) û

5-karbonhîdrat



Sıddık Ergul

Dermansaz


# Şewb Û Enfeksıyonên Weke Şewbê

Bipêşanî em li wateya tendurustîyê binerin:

Li gor Rêxrawa Tendurustî ya Cîhanê (WHO) tendurustî: ‘ku mirov ji rexê ruh û beden û psîkolojiya xwe ve tam baş be’ tê zanîn. Di vî warî de ku em li mirovan dinihêrin yekî ku tam bi tendurust be wê kêm bê dîtin. Em dikarin bibêjin her mirovek xwedî pirsgirêkek a tendurustîyê ye. Lê belê dema ku min li Zanîngeha Ataturkê (Erzurum) di beşa Dermansaziyê (dermanfiroşî) de dixwend wî wextî min li ser şewb û enfeksiyonên şewbê û dermanê ku di van nexweşiyan de tên bikaranîn de lêkolînek li dar xist.



Weke ku tê zanîn bi kûrtasî şewb (grib); ji aliyê mikroorganizma ve çê dibe. Ev mikroorganizma jî vîrûs in. Enfeksiyonên şewbê jî ew in ku ji şewbê siviktir lê di semptomên xwe de dişibihin şewbê.



Heya îroj tu dermanên ku van nexweşiyan tedavî dikin nehatine dîtin lê dermanên ku semptomê (nîşanê) wan kêm dikin pir in. Ji vî şiklê tedaviyê re jî dibejin tedaviya semptomatîk. Ji bo ku şewb bi sebeba vîrûsa çêdibe tu entîbiyotîk di tedaviyê de nayên bikaranîn. Çunkî entîbiyotîk tesîrê li vîrûsan nakin (Vîrûs tim xwe vediguherînin ji bo vê yekê bersiv

nadin entîbiyotîkan).

Tedaviya van nexweşiyan a herî baş ev e; ku mirov pozên xwe bi aveke hindik şor û şîloz paqij bike û devera ku oksîjana wê zêde be bijî. (Amadekirina ava bixwê: di nav qederê qedehek çay av de kevçiyêkî çay xwê bihelînin)

Parastina ji şewbê bi xurt bûna pergala îmunolojiyê çê dibe. Ji bo vê yekê jî divê mirov xwe derzî bike û vîtamînan ji xwe kêm ne kin. Mirovên ku nexweşiyên wa yên metabolîkî (weke diyabet, tansiyon hwd) hebin divê li dera ku hewa wê paqij bijî û xwe ji derê qerebalix dûr bi kin.



Ji bo nasîna (teşhîskirina) şewbê (grîbê) divê mirov biçe bijîjk û li gorî dermannamêya wî û qewîtîyê wî bi tevgere.


Li gorî gelek lêkolînan tê xuyanîn ku tenê bi aşi mirov nayê parastin ji grîbê.



Dermanên ku di grîbê û enfeksiyonên weke grîbê de tên bikaranîn tenê ji bo tedaviya semptomatîk e. Sedamên grîbê ji holê ranake.

Em bi kûrtasî dibêjin serê her tiştî tendurustî ye.

Bimenin di xêr û xweşî ye de….



**Dilazad ART**

**Nivîskar û Lêkolînêr**

# Li Ser Jiyanê Axaftinên Taybet

***Heta Smaîl negirî ava zemzem derneket.

*** Ê go Brahîm naşewitenê Xwedaye,
Ti tewanê agir tûneye.



*** Ger biraye Yusuf ew ne avetibane bîrê
Yusuf nedibû wezîrê Misrê.
Birastî xeletîyek e mezin kirine birayên Yusuf,
Lê Xwedê ev ji wezirtîya Yusuf re xiste sedem.

*** Mirov mîna daran a. Dar ji bizrikekî/tovekî şîndibe. Bi av, roj, ax û hewaye mezin dibê. Heta digihe gihaştînîye fekî û kulilka didê. Ku pîr dibê hino hino çiqlê/şaxê xwe xhar dikê. Mirov jî wek darê ye. Peşî ji piçûkbûna xwe mezindibê û digihêjê. Dûvre hino hino pîr dibe û ji hêzê dikevê.

*** Heyfe ku; her dem zilamekî neqenc hezar zilame qenc xeradikê. Tu car hezar zilame qenc zilamekî nebaş baş nekirîye.

*** Rihe mirovan lewitîbê bedena (laşe) wa jî dilewitê.

*** Jin mîna welatan e.
Destxistina wa na pirr bi zahmet e.

Ku bi destket, kefxweşîya wan hêjaya bi destxistina wa na.

*** Di welat e min de ez kirme mêvan,
Û mêvane min bûne xwedî mal.

*** Geh tilopek bûm di deryaye de
Geh deryayek bûm di tilopekê de.

* * *
Zaroktîya min bi pirsgirekên mezina derbasbû. Min ti car zaroktîya xwe ne jiyand.



*** Jiyan li ser wate hatiye avakirin. Hemu tişte ku heye ne bihebuna xwe, lê bi wateya xwe tê naskirin. Ger wate ji jiyana mirovan werê rakirin mirov û jiyana mirovan mîna darekî hişk û ziwa dimênê.

Bêje jî biwate biqîmet û birûmet dibê. Ger wate ji nav bêje werê derxistin bêje ji gotineke hişk û ziwa pêve naçê wirde.

Ger ji gotinên Mewlana, Yunus Emre, Xanî, Cizîrî û Teyran wate werê rakirin ew beje dibin çi?

*** Azman û derya waren azadiya bê dawîne.

*** Jiyana şervana ji ya miroven dî cûdaye. Şervan tu car nakevê kefa dinye, xweşîya dinye. Şervan dibe hîşe xwe ne berdê ser zewacê.

*** Mirov çiqas bidê wulqasî tê dest. Cihê tişte diçê tê dagirtin.

*** Dîn heta xisare nedin mirovan çêdibê ku gotinên van bi hikmetbin.

*** Mirov di jiyana xwe de gelek tişta dide hev. Demek duvre yek bi yek wan tavejê.

*** Mejîye me bûye tinge agahîya û zanîne. Bikaranîna zanîn û agahîyen me tûne ye. Tahbeke/xebateke zêdeye em didine xwe. Lê belê em bi vê tahbê/xebatê kefxweşdibin ku em dikin.

*** Mirov ji gihaştina xwe pêve,

dest bi karê dinye dike. Hemû kar û xebatê mirovan ji bo jiyaneke hesan û rehet e. Evqas zahmetî û şkenca kar û xebatê dinye mirovan tu car nagihijênê dilrehetîye. Jiyan mirova li ber bayê xwe difirenê. Hem jiyana mirov ji serî heta binî li gor merca tê gûhartin.



*** Jiyan bi xwe razeke/sirake. Mirov çiqas li raza jiyane digere jiyan ewqas li ber mirov xerîb dibê. Hem dabûna jiyane ji bo carekê teneye. Jiyan bi du awaya tê jiyandin.

1- Di jiyanêde tiştin dibin, bê destura mirovin. Hem hêza mirov nikare pêşîya van bûyera bigre. Bi awayekî li hemberê mirov dertên.

2- Di jiyanêde tiştin hene ku bi kirinen mirov çêdibin. Ji bo destxistina va na xebata mirovan pêwistdibê.

*** Her sal darek diçênim,
Duwazdeh çiqile/şax e,
Sê sed û şest û penç pel e,
Her roj yek pel diwêşê.

*** Mirov zaroktîya xwe û xortanîya xwe ji bo kamilîye/gihiştine diqadînê. Hemû kar û xebat ji bo navekî bi rûmet bi dest bixê. Piştî bi destxistina nave xwe demeke kin bi vî navî, xwe bi miroven dî dide naskirin. Piştî mirovan ew kes naskirin li gor naskirina xwe pêre danûstandine dikin. Pişti bi nave xwe tevgera xwe kirin li hemberê mirov astengeke dî derdikevê. Ev asteng parastina nave xwe ye. Parastina nav pirr zor û zahmetîye dixwazê.

*** Carna koçberkin ji mala xwe, ji wêlate xwe. Koçberî mirovan dikemilênê. Kesa xwedî hêzdikê.

*** Hûner ji siyasete azade. Lê hûner siyasete terbiye dike.

*** Tevgerîya mirovan li gor sedema ye. Ger sedem li pêşîya mirov ne amadebê, mirov nikarê ti tiştî bikê.


*** Mirov bi qasî duaye le hatine kirin dijê. Li ser mirovan bandûra duaya bêhed û bêhesab e. Ger li mirovekî dua werin kirin

û li rexê dî nifir lê werin kirin ê ku dijwarbe ew kes bi saya wana jiyana xwe didomê.

*** Di dîroka jiyana dinyêdê heta neha bi hezara şer û pêvçûn çêbune.

Bi mîlyonan mirov di bin doza xwe de jiyana xwe ji dest dana.

Gelo van mirovan ji bo çi şer dikirin? Çima xwe didan kûştin? Ji ber çi? Ana ger di deste wan miroven ku xwe dane kûştinde firseteke hatina dinye hebana yê bi hazar carî bi heyf gazin û gilîye xwe ye bênin ziman û ye li zaroke xweyî pişt mayî nifira bixwînin.



Lê belê ev ji heye ku mirov ji bo tiştna dijê. Ya yekem ji bo rûmeta xwe dijê. Ya duduyan ji bo bi dest xistina hesanîyeke jiyane ye. Hem hin mirov armanceke pîroz li pêşîya xwe dibînîn.

*** Her dewletek terorîst e xwe bi destê xwe avadikê. Di dinyede tu kes ji rojbûne ve ne terorîst e. Lê belê mercên jiyanê mirovan di çavên hina de dixê terorîst. Hem xwestina mafe mirovanî, xwestina azadî ji rexê dewletave bi navê terorîst tê binavkirin. Heyfe ku maf xwazî bi navê terorîst tê binavkirin.

Hem balkeşîyeke jiyaneye ku terorîstê her dewletekê heye. Heye ku dewlet ji bo nebaşîye xwe, zilm û zorîye xwe, bê dadîya xwe perdebike bi deste hilanî rexistinen terorîstî avadikê.

*** Parsek; ji xîzana dirava û alîkarîye dixwazin. Pêwiste ku ji maldara û ji dewlemenda bixwazin.

*** Li welatême hezkirin û evîn ji mecburîyetê ye. Derdême gelekin lê derman hindikin.

*** Mirov mîna keştîyekê ye. Jiyan deryaye. Ba dem e. Xwe li ber ba berde. Le dema ba tu birî rêyeke nebaş berê keştîya xwe ji ber ba vegerîne.

*** Marîfet ne bi zilme

debarkirina gel e, belkî marîfet bi dadî idarekirina mirovaye.

*** Mirov xwedî hêz e. Lê ev hêz li hember qudreta Ellah bêçare dimênê. Hêza di deste mirovde û hêza bikaranîna mirov heta sînore qudreta Ellah e. Mirov nikarê germa roje rakê lê belê kare xwe ji germe biparezê. Hem nikarê belaye sirûştî ji masete rakê. Lê belê kare bi xisareke kêm û hindik xwe ji belaye sirûştî biparezê.




*** Em derûvanin. Pêşî li hembere xwe derûvanin. Mirovatîya me bi qasî rastgotina me ye. Di jiyana mirovatîyede peyxember ne têde hemu kes bi kêmasîye. Gotinen me û kirinen me nebûne yek. Ev rewş li hembere miroven dî giraniya nave me hildiweşîne.

*** Jiyana mirov bi awayekî balkeş û bûyerên razanî didome. Ji bo têgihiştina van raza hem hişekî bihêz û danakê Xwedê pêwiste. Ji têgihiştina raza jiyane dîtineke kûr û zirav, xwendineke hem pirtûkî û hem siruştî, ger û lêkolîneke hêja, wane girtineke birûmet pêwiste. Di jiyanêde bi qasî kirinen mirov deste qadere heye. Hem devera deste mirov nagihiye deste qadere digihîye. Bawerîya Ellah zanîneke kûr û fereh hîni mirovan dikê. Birastî hemû tişt ji bo mirov hatiye afirandin. Lê belê li gor mercen jiyane mirov ji tişta kar dibînê. Rastiyeke jiyaneye ku hemû tişte hatiye afiradin yê rojeke bidawîbibê. Li gor vê zagona Rabbanî tû kes ne bêdawîye. Birastî kese xwe li ber hemû bayê jiyane berdidin jiyana xwe bê bela derbasdikin. Lê ev rastî heye ku mirove xwe li ber hemû baya berdide ne mirovên xwedî rûmetin. Rûmetî cûdatîye dixwazê. Cûdatîya ji hemû tiştê nebaş, neqenc dixwaze. Hem rûmet karekî wateyîye. Kesen bi wate li bûyera dinerê dizanê giranbihaya jiyan e.

*** Xwendina pirtûka deryaya. Mirov her çiqas bikevê vê deryaye

dawîya wê nayêne. Her pirtûk li gora wateya xwe bi qîmete. Pirtûkê hêja mîna gêncînîyane. Lê mixabin mirov wek her dem qîmete gêncînîye dirav ne têde nizanê. Ji bo mirov hebê nebê



dirav tene gencînî tê hesapkirin. Ji ber vena ku herdem di dinye de şer û gengeşî hene. Jiyaneke bi rûmet mirove dema me dinavbera xwe de avanekirina.

Tû kes ji zanaya pirsê zaninstî û pirse jiyanî napirse. Li ser berjewendê diravî hemû tişte xwe feda dike lê ji bo zanîneke hêja tu car xisareke piçûk jî na ênê ber çave xwe.

***Xîzanî mirova hem nezan dike hem gemarî dike. Birasti paqijî û zanîna mirovên zengîn ne ji rûmetîya wanaya. Belkî ji serî heta binî ji zengînîye tê.

*** Ware ku mirova ji xwe nehesibênê ewder ji yekî re nabe welat.


*** Şîrete mêranî li zaroke xwebikin. Bi şîrete tirse, bi şîrete reziltî tu kes bi sernakevê. Hem şîret pewiste ku bi ceger û bi werekîbê. Bi şîrete hêja zarok ji qelsbûnê xilasdibin. Li hembere tehlûkeye dinye xwe parastin tiştekî başe. Hem jiyan carna berçav anîna tehlûkaya. Jiyaneke bê tehlûke bi dawîbûye.

*** Mirovên welate me bi zimane dagirgerê xwe diaxivin. Hem vê axaftine ji xwe re dixine şeref. Pesne xwe bi axaftina zimanekî biyanî didin. Lê belê bi zimane xwe nikarin biaxivin. Û ji vê nezanîye fedî/şerm nakin. Bi kenekî tahl dikenin.

Di demeke ku mirov ji zimane dayika xwe dûrdibin ez li ser ziman dixebitim û bi vî zimanî kûl û derd û şahî û hêjarî û dewlemendîye xwe tênim ziman.

Li hemû bajar û navçe û gund û tar û kolanan zarokên gelê me bi

zimanên dagirgerê xwe dipeyîvin. Dê û bave van zaroka bi axaftina zaroken xwe ya axaftina zimane biyani kefxweşdibin. Zarokên welatê me biqasî ferbuna zimane biyanî dûrî zimane xweyî siruştî/zimanedayîkî dibin. Hem tiştekî balkeşe ku pir mirov ji zimane xwe fedî dikin. Miroven meyî koçberî bajara bûne zaroken xwe ferî zimane xwe nakin. Hem ew bi xwe ji zimane xwe roj bi roj windadikin. Dê û bav zimanedayîkî li zaroke xwe qedexe dikin ji ber ku zarokên van zû hînî zimane biyanî bibin. Heyf hezar carî heyf ku gele me yî azadxwaz ketîye rewşekê halo ya lewitî. Xebînet hezar carî xebinet ku mirovên xwe berevane/parezvanê niştîman dihesibenîn hem xwe û hem zarokên xwe dûrî zimane xwe dikin. Hem mafgerê me ji toreya me dûrin. Li ser nave me di xebitin le di armanca wanda em tînînin. Me ji bo armance xwe dixine navgîn. Me di xebitenîn ew behna xwe diberdin. Xwehdana me di herike ew li havingeha ling tavejin ser ling. Em têne kûştin, têne birindar ew li ser me hêza xwe qewîndikin.



Li hemberê van tiştê neyînî daxwazîyaminî hînbûna ziman ji bo rûmeta mi ne. Hem mîna hemû zimana Xweda zimane me jî afirandîya. Hem her ziman ayeteke/delîleke Xwedê'ye.



*** Pir caran xîzanî tevgera li gor nefsame sekinandiye/rawestandiye. Bi sedema xîzanîye me destê xwe ji gelek tişta dûrhişt.

Hem çavtengîya me ne ji sirûştîya mirovanîya me ye. Belkî ji nînbûn û tûnebûna me ye.

*** Bedewbûn li gor nerîn û dîtin û zanîn û toreya mirovan tê gûhartin. Her çiqas bedewbûn bala mirova bikşenê jî ev sedeme ku me jimartin ji ber çav nayen windakirin.

*** Armanca jiyana mirovan dîtin û bikaranîna rastîye ye.

*** Heta nîha min bi Kurdî diramand û bi Tirkî dinivîsand. Ana bi Tirkî diremînim û bi Kurdî dinivîsim. Piştî sed salî mirovên ku wê deme bijîn ye bi hale me yî niha têra xwe bikenin. Ev mirovên ku zimane Kurdî qedexe kirine ye bi navekî reş û nefrîn kevine dîrokê de. Dirok tû carî mirovên zordest û ê bêrûmet efû nake. Hem dirokeke derewan pesne wana bide jî miroven mafe wana hatiye xwarin mafe xwe li zalima helal nakin.



*** Birastî her çiqas hînî zimane xwe dibim têdigihişim ku zimane me ji bo vegotine têra xwe dewlemende. Bi rastî mirov çiqasî nezanbê wulqasî nizane ku nezan e. Mirov di derya nezanîyede wundadibê. Lê xwe dîtin karek û xebateke pir hêja dixwazê.



*** Ma heta kengi ev jiyana bi rezîltî, bi xîzanî? Kendalê di navbera mirovên xîzan û zengîn ji kûrbûnê bine wê xûyanakê. Heyfa rûmeta mirovatîyê.

*** Di dewleteke de ji bo ewlayîyê artêş/leşker pêwist e. Hem ji bo parastina dijminên derveyî hem ji bo maf parastina mirovên hûndûrî artêş pêwist e.

Lê belê artêş pêwist e ku ewlayîye bide mirovan. Dema mirov çav hêzen leşkerî kir pêwist e ku



kefxweş û dilşa bibê. Lê mixabin dewleta em tê de dijin dema mirov çav leşkere dewlete dikin bi nefrîn li wana meyzedikin. Hem dîtina leşker pêwiste ku wêrektî da ba gele xwe. Mirov ji leşkere xwe pêwiste ku netirsê. Hem leşker ji ciwanen gel hatiye damezrandin. Lê ew ciwan dikevin bin fermane leşkerîde.

*** Zaroktîya xwe bi jiyaneke zilamî derbaskir. Ne zaroktî di destê me de ma, ne zilamtî para me ket. Heta em têgihiştin rastîya jiyanê temene me bi xeletîya, çewtiya derbasbû. Şopê ku me ajotin nerastbûn. Em hatin xepandin. Hem bi ol, bi cand, bi kesatî, bi zanistî, bi hostayî em hatin xapandin. Me digot emê dîrokê pey xwe de biajon. Lê mixabin em di nav pelê dirokê de hatin windakirin.

*** Heyf û mixabîyeke pir balkeş e keçike dema me li ku derê xortekî avare, serserî, berdoş, beredayî hebê pêre dikevin pêwendîya evînê. Hem ev keçik bedewin hem xweşikin lê belê kêmhişin. Ger ku ne kêmhişbana yê pêwendîye xwe ji miroven tolaz qutbikirina.

*** Bidest xistina agahîya û zanînê gelek hesan e. Li hembere vena piranîya mirovan ji zanîne xwe dûr digrin. Mirov bi piranî xwe bi tişte vala dilebikênê.

Hem tingê zanîne çêbûn e. Hem hişême bûye tingê zanîna. Li hember van zanîna gelek caran mirov ya rastî ji nav ya xelet nikarê derxê.



**_Bahadîn Cibilgiravî_**

**_Lêkolînêr_**

# Jiyana Zanîngehan



Li zanîngehan tiştên ku tê serê me û tiştê ku li ber çavaye ezê ji we re pêşkêş bikim..

Xwendevan di jîyanêde bi salan xebatên giring dikin û mesrefeke pirgiran dikin hetta ku werin têkevin hindirê zanîngehê. Pêşî dibistana SEREYATÎ, ya NAVÎN û ya DAWÎ (LİSE) xelasdikê. Piştre kû qezenç kir tê zanîngehê. Ez jî yek ji wan kesa me. Di nav wan şert û



mercên girande di sala siseyan de min qezençkir zanîngeh. Berî kû ez werim xeyalên mezin difikirîm. Ez gihabûm rê ya xeyalên xwe, xeyalên ku min dikir ne hindik bûn. Li gor min dema ez herim zanîngehê; di destê herkesî de kompîtur heye lêkolîneran dikin, ji pirtûkxane kêm derdikevin, li kolanan li ser zanînan diaxivin, têkîlîyan li ser xebatên zanistî dikin, nerîna tev kesan nerînek xweşbînîye, di polande gengeşîyên felsefî-edebî-zanistî-çandî çêdibê…



Ji xeynî wê min di got piştî ku wextê me hebê xebatên civakî bi azadî wê bê kirin… Lê berî ku ez werim zanîngehê nasên min ê ku berî niha zanîngeh



xelaskiribûn teşqelê ku têne serê meriv ji min re nedigotin. Lawê apê min zanîngeh xelaskiribû (ya ÇUKUROVA). Dema bihîst ku min zanîngeh qezençkiriye bi lez hate cem min û got: ”Min binere Bahaddîn, sala pêşî gelekî girînge, ku te sala pêşî keçikek li gorî serê xwe dît te dît, an tu ma bêjin (azib) hetta sî salî, weke min.” Aqlê wî ji tolazîyê re dişixulî!. Dê û bavê min ji ber ku min di piçukanîyê de hetta niha şermokî an jî fedîkoyî mezin kirin, min wî bê bersiv hişt, min ma'dê xwe tirş kir û serê xwe xist ber xwe… Ez jê aciz bûm… Ma hevqas jiyana zanîngehêde ew di serê wî de ma bû, çima tengasî û teşqelên zanîngehên ji min re nedigot, çima xweşîyên û zanistîya zanîngehê ji min re nedigot; tobeeee!. Lê dev ji min bernedida û talî jî got: “Law tê gelekî poşman bibê, ku tu wiha bikê tê weke gundîyekî herê weke gundîyekî vegerê!” Ez kesekî gelekî fedîkoyîbûm, wê demê ew gotin di dilê min de nikarîbû hatiba mehandin. Ew derbas bibû dor giha lawe xalê min, wî jî zanîngeh xelaskiribû (ZANENGEHA KARADENÎZ YAN TEQNÎKÎ). Em gihan cem hevdû li mala hevalekî, çilo li cem min rûnişt û bi dest şîretên xwe kirin; “Lawê xalê min dema ku tû çûye zanîngehê li cem welatparêzan be, li welatê xwe xwedî derkev, haya te ji kuçikê du ling hebê, êrîşî te nekin, bûyerên politîk zêde çêdibin…” Lawê xalê min jî ez kezebqetandîkirim,



berî niha tiştekî wiha ji min re negotibû, tu kes behsa xeyalên min nakê, law ma ezê herim diskoyê an herbê an zanîngehê, min fêhm nekir!. Dor gihaşt dê û bavê min; “Law bela xwe li tiştekî neke, li xwe miqatebe, ji tiştên sîyasî dûrkeve, pirtûk mirtûkên kurdî tu bi xwe re negerînê, nekeve nav civakên polîtîk û cema'etan, ji wan dûrbe…” Serê min kirin şorba nîskê; herkesî tiştekî dibêjê, tiştên wan ez kirim tayê…



Min xwe da hevdû bi hevalên

xwe re ketime rê ya bajarê zanîngehê. Mamosteyek ji bo alîkarîya qeydkirinê bi mere bû. Em gihaştin bajarê zanîngehê û ketin rêya alîyê zanîngehê. Sê derîyê wê hebûn; em li alîyê derîyê B'de çûn. Di hindirê serê min de tiştê derbasdibûn: 'Niha herkes behsa zanistî



û tiştên teknolojîk dikê, di destê her kesî de kaxezên zanistî, kompîtur ser çokan li milê gelek talebeyan ji bo xebaten zanîngehê...." Em gihaştin cem derî; çawa em ketin hindirê zanîngehê dîmenên di serê min de yek derbasnebû piştî neh-deh gavan keçikek û kurek destê hev girtine li hemberî me tên, hinek dî em meşîyan lê dîmenên weke hev zêde dibin: kurek u keçikek di destê hevde dimeşin, yek do sê çar pênç... xelasnabin. Min ji xwe re got "heylooo, şîretên lawê apê min li hemû kesî bandor kirinê.'

Min qeydîya xwe kir û ketime" yurdê" ji bo li vir bibînim; di yurdê de min digot qey nizamek an jî sazîbûnek heye; lê mixabin em şeş heb xwendevan di odeyekê diman, tû kes paqijîya xwe nedinerî, bi şekalên xwe diketin hindirû, tev gorê xwe radizan, cilên wa yên xwêdangirtî li rastabûn, bêhna xwêdanê difûriya... Bi kurtî yurd ne paqijbû ji ber genîbûna wê min ranekir ez derkitim malê...


Sala pêşî bi hevdîtina hevalên li gor serê hevdu û girtina malê derbasbû. Dibistan sala pêşî dîtina zimanê ingilîzîbû di zaningehê de. Ew sal yeknesak derbasbû; ders û mal. Ez diketim tengezarîyan; ez neketibûm nav ciwanên tirka...

Piştî saleke em bubûn pola yekemîn; derza pêşî TÜRK DİLİ VE EDEBİYATÎ bû. Mamoste çawa kete hindir dest bi derzê kir gotina herî pêşî: "arkadaşlar milletlerin sonuna gelen çe,ça,ce,ca onların dillerini gösteriyor; ama kürtçe hariç!




kürt diye bir millet olmadığına göre böyle bir ekte sözkonusu olamaz, maalesef bir kısım kardeşimiz hala bu dilin varlığına inanmaktadır, kürtler türklerin alt kollarından bir millettir, tabi onlar da insandir...." Piştî wê

gotine ez rabûm ser xwe min got: “na ne raste, ew tiştek inkarîye. Ez kurdim û kurdî jî heye…” gelekî zora min çibû; min xwe negirtibû. Layê xalê min ne nehekbû, jeton niha ket ku çi hatiye serê wî…. Wê rojê piştî nîvro derza DÎROKA ŞOREŞÊ(inkilab tarihi) destpêkir. Mamoste kete hundir destpêkir, her du gotinên yek jê pesnên tirka bû. Dihişte hêrsên tirkan ê netewî di polê de bifirê.. Lawê xalê min behtir mafdar derdiket di wê rewşêde.. DERD Û KULÊ WAN NE ZİMAN Û DİROKBÛ!... Wexta ku ders xelasdibê de ka were bi van hevalên tirk re bibe heval, bi zarokbûna xwe hetta niha neteweperestîye pompeyî wan dikin paşê bi ciwanên kurda re dikin mercekekêde. Dema ku ciwanekî kurd bi ciwanekî tirk bibê heval ya wê ciwanê kurd ji ziman, çand û nasnameya xwe tavîzbidê an jî hevaltî gelekî dijware; çimkî tev sîstemên netewî her tiştî yên netewekî tenê dihesibînê, bi gotinekê din ciwanên tirk di dilê xwedê hemi tiştên vî welatî, ji xwe tenê re dixesibînin. Loma gelek caran ciwanên tirk bi tirka re ciwanên kurd jî bi kurda re dibê heval. Lê ciwanên tirk ku hinekî xwedî ferasetbê û li wan gotinên sîstemê yên înkarî xwedî dernekevê ciwanên kurd jî bi dilsozî pê re dibê heval. Dawiya dawî sedema pirsgirêkê em dinehêrin û dibînin dîsa sîstema înkarî derdikevê hemberî me…



Erê tiştê ku di serê xwendevanekî kurd yên zanîngeh ê derbasdibin xelasnabin. Mixabin gelek caran ciwanên kurd li êrîşa tirkan têne ser hişê xwe hetta ku êrîşekê lê nekin li ziman, çand û dîroka xwe xwedî dernakevê. Loma hinek dibêjin aklê kurd piştî êrîşekê tê serê wî! (Lê dîsa jî em wê gotinê napejirînin). Saidî kurdî dibêjê ‘’EM TÊNE XAPANDİN LÊ EM KESÎ NAXAPÎNİN”.

Dema ku ders xelasdibin yan em diçin malê an jî pirtukxanê dixebitin; azmunên niha hemû nêzîkî hevdû kirinê ji bo ku tû civakên xwendevanan, xebatan nekin, çalakîyan çênekin. Bifikirin, ciwanekî kurd ji bo ku zimanê

xwe bixwînê, xwepêşdexînê wext jê re namînê, azmûna yekemîn, yan duyêmîn û yên dawî(FÎNAL) nêzîkî hevin, tu nikarê serê xwe rakê ji dersan…



Dema ku êrîş, înkar, zordestî, xapandin hemû digihejin ser hevdû, yek bikê nekê di deverekê pêvde diteqê, bi wê teqandinê tê serhişê xwe, hişyar dibê; ma ew pencsed sal kurd di xewde nehiştine!, wek ku Bedîuzzaman Saidî Kurdî dibêjê;"KURDNO RABİN SER XWE EDÎ BESE EW PENCSED SALÊ HÛN RAZANE", ma ne sîstema înkarî hiştîye ku kurd di xewde bibînin. Lewra ciwanên kurd di zanîngehê de ji bo xebatên xwe, ji dersê xwe dibînê û dibistana xwe dirêj dikê, di wextê xwe de xelasnakê. Yên kû di wextê xwede idare nekirine dev ji xwendinê berdane jî hene; dev ji dibistanê berdanê!!. Bi kurtayî zanîngeh caran ji ciwanên kurd re kedxwarîye! Tu dikêvê hindirê zanîngeha kedxwarî destpêdikê hetta kû tû xelasdikê; ez ne bi paranoyak difikirim, ew hemû me bi çavê xwe dîtin di serê me de jî derbasbûnê. Ji bo qeydkirna zanîngehê bi çavekî neyar li me dinêrin, ji bo kirêkirina xanî hezar pirsî dibêjin (dibê qey em ji heyvê hatine!), esnaf pirsa wî ya pêşî: tu ji kuderêyî?, li kolanan awirên tûj, mîrovên cirnexweş… Ew tiştê kû ez dibêjîm li bajarê tirka derbasdibin. Kî çi bêjê bera bêjê biratîyeke derew di navbera me û tirka heye loma ev pirsgirêk çêdibin; mixabin di hindirê cema'etan jî li hevdû nakin, biratîya oldarî jî qey hetta deverekêye. Tirk biratîyeke wiha duxwazin; dev ji zimanê xwe berd, ji çanda xwe fedî bike, dîroka xwe jibîr bik, ji kevneşopî û toreyên xwe fedî bike… di dawîyê were em bibin bra! Qaşo biratî weke hevdû wihaye li gorî wan! Li deverekê kû wekhevî tinebê biratî jî dijware, biratîya newekhevî tiştekî betale. İcar piştî wan gotina ez dixwazim bêjim em li zanîngehê newekhevin, em weke mêvanekîne ew jî (TİRK) xwedîyê virin. Mu'amela wiha tê kirin mu'amela wekhevî û însanî tuneye.



Ciwanên kurd piranî ji ber sedêmên neheqî hemu bi hevrene,



yekîtîyan wa wiha çêdibê. Ma wê çibikin! tiştekî ku bikin tûneye, ji ber nakokî û neheqîyê bazdidin. Ciwanên kurd hewceye ku destê hev bigrin li dijî nakokîyan têkoşînekê bikin xwe biparêzin. Ku di dibistanêde yekbunek di navbera xwe de çênekin otoasimilasyon an jî asimilasyon wê wan jî windabikê...

Ez bi çi xeyalên hatim û çi hatin serêmin, ma ku hinek êrîşin mi bikin ezê çawa bi zanistî xwe pêşxim? Ma ezê çawa ji bo wan sîstemên înkarî re xizmetê bikim? Dema ku wekhevî ji min re neanîbin wê çawa qîma min bi biratîya derew bê? Tiştên zanistî û teknolojik, li devletên dinyayê de xizmeta tev netewan dikê; lê çima di devleta me, Tirkîtîyê re xizmetê dikê? Çima ezê bibim xizmetkarê sîstêmên ku êrîşîmedikin?... Ew pirs duvdirêjin, em karin hîn behtir bêjin.

Enerjîya ku min di xeyalên xwede şewitandiba hemu diçê parastinê. Dijminên xeyalên min e ev sîstem!


Lê gava devleta kû em lê dijîn wekhevî heba pirsgirêkên sîstema, otoasimilasyon, êrişî, neheqî… tunebaya wî wextî minê tev enerjîya xwe daba xizmetên zanistî û teknolojîk, wêjeyî, çandî ...h.w.d. Wê devlet jî pêş de çûba ez jî, wê devlet jî rehet bibûya ez jî. Wê devlet bibê xwedî qedrê gerdûnî, bi şarezayî bê bîranîn, belkî wê di dinyayê de bibê nimûneke bêhempa. Wî wextî tû dev ji xeyalên xwe jî bernadê, xeyalên nûjen jî we werin meydanê; çimkî peşketin di deverên azadî de dibê. Azadî ku hebê yek tiştên nû avadikê, ramanên nû avadikê; pêşketî tê holê. Pirsgirêk tunebê rehetî ji herkesî re heye; lê pirsgirêk hebin rehetî ji tû kesî re tuneye..



Azadî; civakek bêgengeşî, wêrek, zanistî, şareza pêşberî mirovan dikê; zordestî: civakeke tirsonek, kezebqetandî tîne holê. Wekhevî jî dihelê di navbera gelên dijîn tû pevçûn dernekevê, kes xwe mezin nehesibînê, mezintîyê li dijî hevdû nekê, mafên hevdû nexwin, her kes li çavekî weke hev li hevdû binêre wekî di jî sîstemê devletê ji hemu kesî re bi adaletbê, sîstem ji bo neteweki ne hatibê damezrandin an jî li ser navê neteweki zagonan, krîteran, rêgezan dernexînê. Tev sîstem ji bo tev insanan bê. JÎ BER WÊ YEKÊ DÎ DAWÎYÊ EZ JÎ DIBÊJİM LI DERDORA ME AZADÎ Û WEKHEVÎ TUNEBÊ EM JÎ LI CİHÊ XWE NASEKININ, REHETÎ JI ME RE TUNEYE... BIJÎ AZADÎ Û WEKHEVIYEK GERDÛNÎ...










***Ridwan Xelîl***


***Lêkolînêr û Ragihaner***

... û evîn bû destan
Ne li ser zimanan
Bi nivîsê hate belavkirin.

# Di wêje ya kurdî de pirtukek nû

Pirtûk bi tevayî ji 2 destan û ji 2 helbesta pêk tê.

Destana Evînê, Destana Şikestî, Leylan û Zelalname sernavê helbestan a. Lê DESTANA EVÎNÊ ji 25 beşa pêk tê, destana şikestî ji 15 beşa pêk tê.




Peşgotina pirtûkê bi taybetî li ser felsefeya ziman rawestiya ye. Nivîskarê pirtûkê Dilazad li ser ziman ramanên xwe bi vî awayî dibêjê: ‘Ziman serbest e, azad e. Bêje, wek ku tê dil tê ziman. Ziman di axaftinê de rêbaza xwe bi awayekî sirûştî ava dike. Dema hin kes an hin sazî rêbaza li ser ziman didin an dixin pergalekê de ew tevger siruştiya ziman birîndar dike û car caran dikuje. Ji bedela zimanekî sirûştî ku zimanê zikmakî ye, zimanekî çêkirî tê meydanê. Bi vî awayî bi hebûna ziman tê leyîzandin û ziman xerab dibe. Êdî ziman dikeve bin bandora hin kesan. Zimanê wan kesan û yê civakê ji hev dûr dibe. Mafê tu kesiy an tu saziyan nîn e ku zimanê civakê li gor zanabûn û berjewendiyên xwe birêbaz bike. Her ziman di sirûşta xwe de paqij û zelal e. Divê rêziman nebe bingeha zimanê civakê. Zimanê ku tê jiyandin bingeha rêzimanê ye. Ne mecbur e ku zimanê tê axaftin li gor rêbazên rêzimanê bibin. Ku cûdatî di navbera zimanê tê axaftin û yê rêzimanê de hebin divê zimanê tê axaftin bingeh bê pejirandin.‘

DESTANA EVÎNÊ ji navê wê diyare ku evînê tênê ziman.

Lê ne evîneke bê wate.


Dinava vê evînê de jiyana sirûştî, bihar, cejna newrozê, koçberî, talankirina war a,

wêrankirina dil a, şikestiyên xurbetê, hezkirin, ji hev dûrketin, jana evînê, berîkirin, xeyalên gihaştinê, xeyalên rojên bihurîn, şepirzetî, gihaştin, daxwaz, dawet û ji nûve avakirina jiyanekê heye.

### *Dilazad Kî Ye?*

Zaningeha Dîcleyê qedand.
Le ser çand û hûner û wêjeyê dixebite.
Nivîs û helbest û lêkolînên wî yên bikurdî
û bitirkî di kovarên cihê de hatine weşandin.
Yekem pirtûka helbestvan bitirkî binavê
"Hasretin Ağıtlar Yakılasıdır NÛPELDA'YA AĞIT"
di sala 2001'ê de ji hêla weşanên 'insanca yaşam'
ve hatibû weşandin.
Ev pirtûka yekem e ku bikurdî nivîsiye.
Ji Weşanên Zanîngeh,
pirtûk a nivîskar, helbestvan û lêkolînêr
Dilazad a bi navê 'DESTANA EVÎNÊ' derket.
Bi kurtasî jiyana nivîskar:






***Ji Destana Evînê dîmenek;***

Evîn
Pirseke bêbersiv e
Dûyekî bêagir e
Di paşila evînê de
Wezîr dibin rezîl
Rezîl dibin wezîr
Di dergaha evînê de
Şah û geda
Şêx û mirîd
Ciwan û pîr
Jin û mêr di yek safê de ne

Bîrkarîzan/Matematîkzan

# Jimarê û Hejmar

*Bîrkarî/Matematîk* ji *jimarê* û ji *jimara(Hejmar)* dest pêdike.

## *Jimarê (Reqem):*

ji bo nivîsa jimara, nîşanên ku em bi kartênin ji wan re jimarê te gotin.
Jimarê={0,1,2,3,4,5,6,7,8,9} Mîna ku ve dît deh(10) Jimarê henê.

## *Jimar(Hejmar):*

Ku jimarê bi xwe an jî bi jimarêyên dî verin ba hev û watekê piranî an kemasî bidin dibin jimar. Jimar çiqasîya hebûnekê dîyar dike.
Mînak: -1, -45, 0, 5, 75, 146, …
Hemû jimarê jimarin le deh jimar tene jimarêne.



Ji bo destpêkirina matematîke zanîbûna nîşanên matematîke girînge!

| Nîşan | + | - | "X" "*" "." | "÷" "/" "$\frac{x}{x}$" |
|---|---|---|---|---|
| Wate | Zêdek | Kêmek | Caran | Dabeş |

| Nîşan | = | ≠ | ∪ | ∩ | ∈ | ∉ |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Wate | Yeksan | Nêyeksan | Hevedudanî | Hevbirîn | Hêman | Nêhêman |

| Nîşan | < | > | ≤ | ≥ | ∞ | ≡ |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Wate | Biçuk | Mezin | Biçuk û yeksan | Mezin û yeksan | bêdawî | Hevkêş |

| Nîşan | (…) | […] | {…} | / | ⇒ |
|---|---|---|---|---|---|
| Wate | Kevan | Kevana Bi goşe | Kevana kome | Fera/ferq | Eger(ku) |

# *Jimar*

1) ***Jimarên Sirûştî:***

Bi nîşana "N" nîşandibin.

N={0, 1, 2, 3, 4, 5, ... }

Her hêmana di nav kevana kome de jimareke siruştîye.

***Mînak:*** "a" û "b" jimarên siruştîne a+b=24 Li gorî wî hawî encama (a.b) hêrî biçûk çiqasê?

a)-23 b)0 c)23 d) 44 e)63

2) ***Jimarên Tam:***

Bi nîşana "Z" nîşandibin.

Z={∞…,-2,-1,0,1,2,… }

Her hêmana di nav kevana kome de jimareke tam ê.

***Mînak:*** a û b jimarên tam û ji hevdû cûdane.

a.b=36 li gor wî hawî encama (a+b) a herî mezin ji a herî biçûk çiqas zêdeye?

a)12 b)15 c)20 d)24 e)25

3) ***Jimarên Rasyonel:*** Bi nîşana "Q" nîşandibin.

a û b her yek jimarên tam ê û b≠0 li gor wî hawî jimarên ku awayê a/b bê nivîsandin dibe jimarên rasyonel

Q={$\frac{a}{b}$ :a,b∈Z û b≠0}

***Mînek***: $-\frac{4}{11}, \frac{1}{3}$, -2, her yek ji van jimara rasyonel ê

4) ***Jimarên Nerasyonel:***

Bi nîşana "Q'" nîşandibin.

Jimaren ku ne irrasyonelin û encama wan nayên hesabkirin dibin jimaren nerasyonel.

Minek: $\sqrt{2}, \sqrt{3}, \sqrt[3]{5}, (\sqrt{2}-1), \pi, \dots$

5) ***Jimarên Jimartine:***

Bi nîşana "N+" nîşandibin.

N+={1, 2, 3, 4, 5, …}

Her hêmana di nav kevana kome de jimareke Jimartine.

6) ***Jimarên Rast(Reel):***


Bi nîşana "R" nîşandibin.

Tevlîhevbûna komên rasyonel û nerasyonel koma jimarên rast(reel) pek tênê.

Yanî: R=QUQ'

***Mînak:*** a>0 û a.c<0 û a.(b-c)<0

## *Bi Kurtasî*








**Kategori**

- Rojev
- Weşanxane
- Kovar
- Zanîngeh
- Civaknasî
- Dirok
- Huner
- Xe
- Raghandin
- Sînema
- Video

## e-kovar a Zaningeh e !?

3 afiye nûvan · Gulan - 21 - 2011 · 1 Şîrove

Kovarek nû...

Ekolek nû...

Nerînek nû...

Jiyanek nû...

Zaningehek nû...

Bi mejiyên ciwanan...

Bi keda xwendekaran...

Bi hevîyên gele me e bindest...

Ji bo ku zanista kurdî vegere zimanê dayika xwe...

e-kovar zaningeh...

e-zaningeh...

Cihe civîn a zanist û zanyaran.....

Kovara zanist û lekolînê...




## e-kovar zaningeh...

*Par bike*

Hide Sites

Kovar

## Yeni Sinemanın Genç Yönetmeni

3 afiye mamestegunes · Gulan - 28 - 2011 · Şîrove bike

( Serhat Karaaslan'la Röportaj )

Serhat Karaaslan Kadir Has Üniversitesi Film ve Drama yüksek lisans öğrencisi. Dört kısa filmi bulunan ve en son çektiği " Bisiklet " adlı kısa filmiyle büyük beğeni toplayan genç yönetmen, katıldığı birçok festivalden de büyük ödüller alarak döndü. Bu sene Cannes Film Festivaline de katılan genç yönetmene uzun metraj çalışmasını sormayı unutmadık. Kısa filmde merak edilenleri, Bisiklet1 ve yeni sinemasını Serhat anlattı.

Berdewam »

*Par bike*

Hide Sites

Sînema

## O Kadar da Demiyordum! Meğer CHP Zulmün Öbür Adıymış!

3 afiye mamestegunes · Gulan - 28 - 2011 · Şîrove bike

Bugün 27 Mayıs. 1960 yılı, ordu içinde bulunan cuntanın yönetime el koyduğu o girift dönemin yıl dönümü. ... Ülkeyi tek parti diktatörlüğü ile yöneten CHP'nin ve ondan bıkmış olan bir milletin öyküsüne kısaca bakalım isterseniz. Daha sonra olayları daha güzel irdeleyeceğimize inanıyorum.

**Rêwîberî**

- Rêwîberî

**Linkên Hêja**

- Kovara Rûngeh
- Medyaya Kurdî
- Nûbihar

**Linkên Teknolojîk**

- [illegible]



Safî şemirand vexwarî durdî
Manend-i durê lîsanî kurdî
(...)
Da xelq-i nebêjitin ku: "Ekrad
Bê ma'rîfet in, bê esl û binyad
Enwaê milet xwedan kitêb in
Kurmanc-i tenê di bê hesêb in.

zanîngeh
Kovara Zanist û Lekolîne